***-Li** 14.4an , Komela Ciwanên Kurd li Sûriyê , civata xwe ya fereh li dar dixe . Rapora salane ya li ser rewş û çalakiyên Komelê tê xwendin û rewşa Komelê ya tevane ji aliyê nûnerên herêman ve tê nirxwandin . Hêjayî gotinê ye , bê xuyan ku, nûnerek ji komîta rêzanî ya partiya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê , ji ber Encûmena giştî ya Hevben Kurd ve , di gel gotinekê û piştgiriyê jî , lê beşdar dibe.

* - **Di** 21.4an de, Komela Ciwanên Kurd li Cindrêsê , bi boneya cejna rojnemevaniya Kurd , şahiyek bi alîkariya Koma Zanîn ya folklorî û Hunermend Sadêq Dilyar , şahiyek li nêzîkî gundê Miskê , li darxist . Şahî bi stiran reqis û çalakiyan zengîn bû.

* - **Li** 22.4an de jî, Komelê dîsa bi wê boneya jorîn , komcivînek li Helebê , bi beşdariya dora /25/ kesên ciwan, li darxist. Di komcivînê de, birêz Reşoyê pîrê , waneyek li ser rojnamegeriya bi zimanê Kurdî li Sûriyê, pêşkêşkir û beşdaran jî bi pirs û vepirsên xwe, komcivîn zengîn kirin .

*– **Bi** boneya cejna rojnamegeriya Kurd , li 21. 4. 2006an , rêxistina P.Y.D.Ks li bajarê Helebê seyranek geş û xweş , bi beşdariya dora(3000.4000)jin , mêr , pîr , kal, zarî, xort û keç ,li Efrînê , çiyayê Qêziqlî di nav darên merxê de li dar xist.

Şahiya seyranê di nav wê xwerista kesk û rengîn de, bi awaz û stiranên folklorî û evînî , çepikên gerim , reqis û dîlanên li hev dest pê bû . Paşê jî, Koma Nûhilat bi stiran, sema û çalakiyên xwe, ew şahiya zengîn kir. Dûvre Koma Kurdax bi şanoya xwe ya rexneyî pêşkêşkir û gotina P.Y.D.Ks jî ji aliyê endamê Komîta rêzanî Bavê Mesûd ve, ji beşdaran re, hate gotin .

Herweha bi xêr û xweşî şahî û seyran bi dawî bû . Û tevaya beşdaran jî , bi kêf ji wê seyranê vegeriyan mal

*- Avokatên Kurd li bajarê Helebê , cejna rojnemegeriya Kurd tînin bîra xwe , şahiyekê bi vê bûyneyê di 21an de, li hafa gola Meydanka delal , di xwaringeha Elteaxî de li dar dixînin . Û bi çepik , dîlan û stiran û xweşiyek bêhempa roja xwe derbas dikin û vedigerin mal.

*- Herdu partiyên bira Azadî di gel Yekîtî bi boneya cejna rojnemegeriya Kurdî , di 21an , seyranek bi haziriya dora 2000 kes , li Meydankê çêkirin. Şahiya seyranê bi alîkariya çalakiyên van Koman xweş bû, mîna Armanc, Raperîn , … hinên dî . Gotina partiya Azadî ji aliyê birêz Mistefa Cuma de, hate pêşkêşkirin . Û gotina xwendekar û avokatan jî hate xwendin . Bi vî awayî şahî bi serî bû .

*- Di piraniya Kilojeyên Zanîngeha Helebê de jî , xwendekarên Kurd , seyranên Buharê , di siruşta navça çiyayê Kurmênc de çêkirin . Bi van ton seyranan dilê xort û keçan xweş û geşkirin .

- Divê em bi bîra xwendevanên Newrozê bînin ku , piraniya partiyên Kurd yên bira mîna Yekîtî (ya dervayî Hevbend û Enî) Pêşverû û Elpartî ya di Hevbendê de , seyranên rengareg di vê Buharê de, ji xelkê xwe re pêkanîn .